

## HINDEK TÊBÎNÎ LI SER ZIMANÊ KURDÎ

**Brûsk REŞVAN**

[reshvan@gmail.com](mailto:reshvan@gmail.com)

**12.09.2005**

Di van rojên dawî de gelek çewtîyên zimanê bala min kişandiye û min biryar daye ku li ser van çewtîyan bîr û boçûnên xwe yê şexsî, bi we xwendevanên hêja re, dabeş bikim. Çewtîyên ku ezê qal bikim li ser şaş (xelet) karanîna peyîvên ku eslên wan bîyanî ne. Wekî her ziman, zimanê Kurdî ji gelek peyîvên nû, taybetî yê teknolojî, kompîter, internet, zanist û hwd, ji zimanên din, nemaze ji Îngîlîzî, distîne û bikar tîne. Ku em hinek nimûne bidin, asîmîlasyon, reaksiyon, diaspora, sîvîl, aksiyon, protesto, medya, propaganda, pozîtîf, negatîf, dokument, federal, realîte, qomîsyon û gelekên din.

Ez bi dil û can alîgirê bikar anîna van peyîvên ku ji zimanên biyanî dikevin zimanê me me lê gava em peyîvên wisa bikar bînin, divê em li gorî xweserîya eslê wê kelîme bikar bînin. Lê ez pir caran dibînim, taybetî Kurdên me yê Bakûr, çaxê peyîvên biyanî dixebitînin, ne li gorî zimanê orjînal, lebelê, li gorî zimanê tirkî ev yek bikar tînin.

Wekî mînak: em dikanin li ser peyîva *kampanya* bisekinin. Kurdên bakûr tim peyîva "kampanya" bikar tînin û bi dîtina min ev peyîv gelek çewt e. Heku hun bejin çima? Bersîva min jî ev e: Di Îngîlîzî de peyîva "campaign" heye ku tirk peyîva "kampanya" ji wê dere standine. Lev kirin (telaffuz) a "campaign" ji "kempeyn" e. Di Îngîlîzî de peyîvekê din heye ku ew jî "company" ye û maneya şîrket dide ku wekî "kimpiny" tê xwendin û taybetî li Kurdistan Îraqê pir belave tê bikar anîn û mîna "kempanya" tê xwendin. Gava Kurdekî bakûr peyîva "kampanya" di maneya "campaign" de dixebitîne Kurdên din heyîrî dimînin jiber ku ev cure telaffuz kirin tirkî ye jibo wan gelek bê mana ye.

Di vî noqtê de, ez dixwazim qala serborîyekî biçûk bikim. Berî çend rojan di Kurdistan TV de bernameyek hebû û rewşenbîrekî heja ji Bakurê Kurdistanê mevanê bernamê bû. Min, bi hevalekî rojhilat re, bernamê temaşe dikir û ji destpek heta dawîya soxbetê, mevanê heja, peyîva "kampanya" di maneya "campaign" de bikar anî. Piştî teva bûyîna bernamê, min li hevalê xwe yê ji Urmîye pirsî ku program çawa bû. Hevalê min ji min re got, "*mevan pir baş dixaxifî lê min fehm nekir çima şîrketek damezrandîye!*"

Min jî got, "*şîrketa çi?*" Bersîv da, got, "*çire, peyîvdar tim behsa kampanya nedikir?*" Min jî vegerand got, "*no, behsa şîrketê nake, lê behsa kempeyn dike. Lê, sed car heyf û mixabin peyîvdarê bernamê ew peyîvê çewt dixebitîne û mîna tirkan dibeje*". Hevalê min ecebmayî bû û go "*sed sal derbaz bûya nedihat bîra min ku kampanya di maneya kempeynê de tê bikar anîn!*"

Wekî tê dîtîn, gelek caran sedema tenegeheştina Kurdan, ne jî ferq û cûdabûna zimanê ye lê şaş bikar anîna peyivan e û/yan jî xebitandina peyivên tirkî, erebî û farsî ye. Derheqa vê peyvê, wekî gotinên dawî dixwazim bejim ku, divê em di axaftinên xwe de, peyîva "campaign" wekî "kempeyn" bikar bînin, ne mîna "kampanya".

Heku meran gotinên xwe bidomîne û hîn şaşîtiyên din bide, van nimûneyên jêrîn jî gelek balkêş in. Wekî min gava dinî ji gotî, di Kurdîya me ya Bakûrî de gelek bandora tirkî heye û divê em zimanê xwe ji wan tesîrên neyênî paqij bikin. Wekî mînak, gelek Kurdên me dibejin "li xwe baş binere" ku rasterast ji "kendine iyi bak" a tirkî wergerandine û dixwazin bejin "li xwe hayadar be"! Ev reng bikar anîn, pir çewt e sedî sed tesîra tirkî ya pir xurt, li ser zimanê Kurdî derdixe hole. Birastî, mirov nikane beje ev Kurdî ye jî çimkî maneya vê hevokê ev e ku, tu li neynûkê meze bikî ku xwe xwe bibînî. Kurd, gava bi Kurdi deng dîkin, dibejin, "li xwe miqate be" yan jî "li xwe hayadar be" yan jî "li xwe hîşyar be"!

Dîsa, taybetî di Roj TV de dibînim, di van rojên dawî de peşkêşvanê/a bernamê dibije, "tu ji ku digerî? ku dixwaze beje "tu ji ku derî telefon dikî? Ev jî nimûneyek baş e ku mirov zelaltir bibîne ku bandore tirkî li ser axaftina me çiqas pir e. Di axaftina Kurdî de, şûna "tu ji ku digerî, Kurd gotinên wek "tu ji ku derî telefon dikî, ji ku derî li tele dixî yan jî li ku derî zengê didî" bikar tînin. Gava yekî dibije "ez li te gerî(ya)m", maneya wê ev e ku "min xwest ciyê te bizanim û xwe bigehmîme te û te bibînim

Her wiha, peyîva "serbest berdan" ji heye ku, bi dîtîna min, xelet tê bikar anîn. Tirk peyîva serbest a Kurdî standine û digel peyîva "birakmak", peyîva "serbest birakmak" ava kirine ku maneya vê jî "serbest kirin" e. Lê Kurdên me dîsa rasterast ji tirkî diqulibînin û li şûna ku bejin serbest kirin, aza kirin û azad kirin, dibejin falan kes serbest hate berdan.

Mînakek din jî "cixare vexwarin" e. Tirk jibo gelek tiştan peyîva "îçmek" bikar tînin, wekî mînak "sîgara îçmek" (cixare kişandin), "su îçmek" (av vexwarin). Di Kurdî de, jibo cixare û av heman peyiv naye bikar anîn. Gava jibo tiştên avî, peyîva "vexwarin" tê bikar anîn, jibo cixare û hwd jî peyîva "kişandin" tê xebitandin. Lê, dîsa giredayî eynî sedema jorîn Kurdên me dibejin "ka were em cixare vexwîn".

Her wiha, min do di Roj TV de temaşe kir ku, di dengûbasan digo "*hikumeta AKPê dixwaze berpîrsîyarîya bûyeran Gemlikê ji me re "bike mal"* ku direkt ji peyîva "mal etmek" a tirkî hatiye standin. Maneya "mal etmek" avetina stûya yekî ye ku divîya mirov bigota "*hikumeta AKPê dixwaze berpîrsîyarîya bûyeran Gemlikê baveje ser stûya me*".

Noqtê ku ez dixwazim bala we bikşînim ser ev e ku, Kurdên Bakûr ne tenê şûna zimanên xwe yê dayikê, zimanê tirkî bikar tînin, her wiha yê Kurdîaxef jî binî tesîra tirkî de ne û mirov dikane beje, heyf û mixabin gelek Kurdên me tirkîya bi peyivên Kurdî diaxifin.

Qet ji bîra min nare, gava ez li Enqerê bûm, ez û çend heval li Medya TV temaşê dikir. Di televîzyona de bernameyek dihata weşandin û di wê bernamê de yek ji beştervanan hevokek nezîkî vê hevokê bikar anî û got *"me herkes şaşitî kir lê kundir di serî Ehmed de peqîya"*! Tirk xwedanê bêwijekê ne ku dibije "kabak başina patlamak" ango "berpîrsîyartîya tiştê li ser stûya yekî de mayîn". Wekî mînak "Azad bi gogê pencerê şikand lê tawana wî li ser stûya min ma". Di zimanê Kurdî de, îdîyoma "kundir di serî de peqîya" bi ti awayî naye bikar anîn, li şûna wê bêwija "mehîr di serî yekî de rijîn" tê xebitandin.

Mirov dikane bi sedan mînakên bide lê ne hewce ye. Bi nerîna min, zimanê Kurdî li Kurdistanê Bakûr û tirkîye, di bin xeterî û metirsîyên pir mezin de ye û ev rewşa xirab her roja derbaz bûyî xirab bûyîna diçe. Erk û wazîfeya me Kurdan ev e ku, nîrx û qinyata zimanê xwe ya şerîn bizanin û li her derê bi Kurdî bifikrin û bi Kurdî xebandin.